



Çandî ya Dumehane ye

Hejmar 1 / Rezber, Kewçer 2016



Mafê çapkirina gotaran ê komîteya weşana Kovara Rêyê ye, lê
nivîskar berpirsyarên naveroka nivîsên xwe ne.
Rêzkirina nivîsan girêdayî hin egerên teknîkî ye.

Re.magazine2016@gmail.com

Çima Rê:

Piştî 15 Adara 2011 an, û belavbûna tevgera ciwanan di warê ragihandinê de, bi hemî celebên, û di rêya şopîner û rexnegeran re hate xuyakirin bê çi qasî ragihandin bi asteke nizim mijarên girêdayî rewşa Sûryayê pêşkêş dike. Tenê rewşa jîyanî hate şopan-din û di heman demê de têgiha (Bijardegerî) ya ku bi roleke sereke di cihêrengiya çandên Sûrî de- yên pêkhateyên vê xaknîgarîyê- dilîze, hate jibîrkin. (Bijardegerî) li gorî têgihek giranbuha ku bingeha şoreşan di cihanê de ava dike; şoreşa di rêya çandê re ne ya di rêya çek û nakokîya leşkerî re. Nemaze di dema ku teror gihiştîya çand û ramanê jî.

Kovarên ku guh didin çandê tv li ku hindek dane jê derketin jî lê ji ber sedemin aborî hatin rawestandin. Ji lew re divê şûngir bo pêkanîna hişyariyekê ku pêdivîyê bide çandê û rola wê ya sereke di dûbarekirina avakirina tiştê rûxandî de li seranserê salên reş di şerê Sûrî de, hebe. Di kovara Rêyê de em li dijî meganîzma jihevderxistinê ne, an ku jihevderxistina dengên çandane li gorî pêkhateyan. Nerîna me taybet e bo çandê, ew jî tevlihevkirina hemî çandên cihanê ye bi hemî celeb û rengên xwe. Çi ku hemî çandên cihanê yek in û heman wêneya cihanê ya ku em tê de dijîn, diyar dike. Ji lew re me xwest em dest bi projeyekê bikin da ku bibe destpêka rêyekê ber bi civandina çandê di çarçoveyekê de ve ne îdyolojî û ne girêdayî alîyeke siyasî yan neteweyî; çandek di kovarekê de civandî, her wisa ronîyê bidin ser hemû celebên çandê: Şano, Roman, Helbest, Şêwekarî, Werger, Sînema û Pirtûkan, çi ku di rêya van celebên re em dê civakê ber bi rêzgirtina çandê ve bibin da ku em teqez bikin her çandek ciyewazîyek wê ya taybet heye, lê di heman demê de hemî çand di çemêkê de digêjin hev da ku nerîna me ji cihanê re ava bike.

Dibe ku ji sedemên paşketina mirov di civakekê de nenaskirina çanda civakên dîtir e, ji lew re em dê di hejmarên kovarê de balê bikşîn ser veguhestina çanda ku bi zimanê Kurdî hatiye nivîsandin bo Erebiyê û ya Erebi jî bo Kurdîyê qena ku bikarbin hevçandek zimanî û çandî di navbera du çandên girîng di rojhilata navîn de ku xwedî dîrokên kevnar in, pêk bînin. Tevî ku şerê Sûrî pêwendî û avakirina têkilîyan qedexe dike. Ev hewildaneke bo ku rola çandê geş bikin û bi bandor be da ku (Bijardeger) bikaribe bi rola xwe ya mirovî rabe di rêya lêkolîn yan nivîsandin yan pêşkêşkirina ezmûnên zengîn re di vî warî de.

Tiştê ku em dixwazin di rêya kovara Rêyê re teqez bikin ew e diyarikirina geşbûna çandê û lihimberderketina çanda tunekirinê ya ku li gorî rewşa Sûrî ya heyî çî sûdê jê nagrin.

Sernivîskarê beşê Kurdî: Xoşman Qado

Naverok

- ◆ Daxuyaniya Rêyê
- ◆ Hevpeyvîn Bi Nivîskar Dilawer Zeraq re
- ◆ Evdo Şêxo\ Rewşenbîrê Tundrê
- ◆ Hisên Zêdo\ Ceng Qerebalixê Zêde dike
- ◆ Hekîm Ehmed\ Kevintirîn Jêdera Rêzimana Kurdî
- ◆ Ciwan Qado\ Helbestin Bijartî
- ◆ Guy de Maupassant\ Textê Jimar 29
- ◆ Haward Shalwitz\
Heft Sedemên Ku Kirasê Girîngîya Şanoyê Didirûn

Nivîskar Dilawer Zeraq

“Min bi awayekî bi dil û daxwazî, bîst salan parsekîya biwêjên Kurdî (Kurmancî) kir.”

| Hevpeyvîn: Evdo Şêxo



Dilawer Zeraq* Nivîskar, wergêr û rewşenbîrê Kurd e. Di sala 1965an de li Farqînê ji dayîka xwe re çêbû. Zanîngeha Dîcleyê, Fakulteya Perwerdehiyê, Beşê Mamostatîya Matematîkê kuta kir. Yekem pirtûka wî ya çîrokan “Kakil” di Adara sala 2002yan de (Weşanên Sîyê, -Xelata Çîrokan a Weşanxaneyê APECyê ya sala 2002yan wergirt-), duyem pirtûka wî ya çîrokan “Bîşîrîna Şermînî” di Kewçêra sala 2003yan de (Weşanên Aramê), sêyem pirtûka wî ya kurteçîrokan Çilkên Pênûsê di Adara sala 2009an de (Weşanên Lîsê) weşîyan.

Dilawer Zeraq, di Cotmeha sala 2005an de ferhengeke biwêjan a bi navê “Ferhenga Biwêjan (Tirkî-Kurdî)” amade kir û ev ferheng ji hêla Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê ve hat weşandin. Nivîskar, di sala 2005an de bi navê “Sêyîneya Winda” dest bi nivîsandina sêyîneyekê kir. Yekem romana sêyîneyê, “Şevên Winda Wênayên Meçhûl” (Weşanên Lîsê, 2005), duyem romana sêyîneyê, “Mirina Bêsi” (Weşanên Lîsê, 2011) sêyem romana sêyîneyê, “Nexşên Li Gîyan” (Weşanên Lîsê, 2014) weşîyan. “Rajena Kurdî” (Weşanên Lîsê) ku li ser rexne û analîza ziman û

wêjeyê ye di Berfanbara sala 2014an de di pirtûkxaneyên Kurdî de cî da xwe. Her weha, Dilawer Zeraq, di gel Mem Wenda “Ferhenga Termên Matematîkê” jî amade kir û da ber çapê (Ferhenga Termên Matematîkê, Weşanên Lîsê, Gulan, 2015).

Nivîskar, hejmarek pirtûk ji Tirkî wergerandine Kurdî. Pirtûkên ku wî ji Tirkî li Kurdî wergerandine ev in: “Mirina Li Madrîdê” (Ji Kurteçîrokên Oya Baydarê): “Gelawêj” 2007, Weşanên Lîsê. “Jîyanê Li Îstasyonê Dest Pê Kir”s (Ji Kurteçîrokên Jaklin Çelîkê). “Gelacîyên Bajarê Nû” (Ji Kurteçîrokên Müge İplikçiyê). “Ejdehayê Sêserî” (Ji Kurteçîrokên Leyla Erbilê). “Şahiya Hêrsê” romana Jaklin Çelîkê, 2011, Weşanên Lîsê.



- Mamosta Dilawer Zeraq, di serî de em spasîya te ji bo boyî vê derfetê dikin û em kêfxweş in ku hevpeyvîna pêşîn a Kovara Rêyê bi te re hatiye kirin.

Spas ji bo Kovara Rêyê jî. Helbet wekî her kesekî wêjehez, hêvî û daxwaza min jî ew e ku Kovara Rêyê bigihêje gellek hejmaran

û bibe sedema avabûna ekol û tradîsyonekê.

- Di wêjeya Kurdî de, helbestnivîsîn rengê herî beloq e û gelek nivîskaran gava xwe ya pêşîn bi nivîsîna helbestan avêtiye, lê belê te nivîskariya xwe bi nivîsîna çîrokan dest pê kiriye, çima çîrok û çiyê ew tiştê serincrakêş ê di çîrokê de ku te ber bi xwe ve kişand?

Belê te xweş got, “helbestnivîsîn”, ji ber ku pirranîya kesên ku tu çêl ji wan dikî helbestê dinivîsin, ji ber ku ew helbestnûs in, lê ne helbestkar in. Helbest, bi raya min, tê gotin; yanî heke kesek helbestkar be, ew berî her tiştî helbestê dibêje; pêşî ji xwe re dibêje, di pişt re jî ji me re. Ew kesê helbestkar, bi rihê xwe, bi dilê xwe, bi mejîyê xwe, bi awayê jîyana xwe û bi rengê ku ew dide jîyanê, helbestkar e. Ez wan kesan wekî “helbestbêj-helbestkar” bi nav dikim, ji ber ku di zimanekî de “helbestkar” û “helbestbêj” zû bi zû nagihêjin, helbestnûs bi awayekî xwezayî û bêguman mafdar, helbestên xwe dinivîsin û li ba min tu xisar û tiştêkî neyînî di vê yekê de tune.

Heke em bîr ser sedema destpêkirina min a bi çîrokê, ez ê karîbim bibêjim, ji rojên destpêkî yên xwendinên min ve ye; ji aliyê min ve dîyar e ku ez ne helbestkar im, ji ber ku min tu carî xwe wekî helbestkarekî his nekiriye; ji ber ku li ba min dil, rih û jîyana helbestkaran cihêtir û rengîntir e. Îcar, zimanê ku dêya min pê bi min re dipeyivî, ji ber xwe ve û di rihê xwe de çîrokê bû û her gava ku ez di zaroktî û xortanîya xwe de, li Farqînê, derdike-tim derve, min hemû gotin û çêlkirin bi şeweyekî çîrokê dibihîstin û çîrok dibû sedema vegotina min a xwe bi xwe. Jîyana me Kurdan jî her çîrokê ye; em mirov -û bi taybetî em Kurd- her tiştê xwe dikin çîrok û vedibêjin. Ji ber ku zimanê me, Kurdî, vê keys û delîveyê dide me û ji me re dibêje; ez çîroka we ya sereke

û esasî me loma jî divê hûn pêşî çîroka min safî bikin. Sedema sereke ya çîroknûsiya min; çîrokîbûna ziman û çîroka ziman e; her weha bi awayekî pirr bi taybetî jî; wekî min got, hayê min jê hebû ez ne helbestkar im û ew rih bi min re tune ye, loma jî min di destpêkê de hîç îşê xwe ji helbestê neanî û min xwe berda nav behra çîrokê û vegotina çîrokî.

“em mirov -û bi taybetî em Kurd- her tiştê xwe dikin çîrok û vedibêjin”

Pê re jî, dikarim bibêjim, di navbera çîrok û helbestê de jî xet-teke zirav heye; ew xet bi çîroka kakilîn tê kişandin. Ew çîroka kakilîn, di helbestê de teng û asê dimîne û helbest li dora wê tê hûnandin, lê di çîrokê de tê berfirehtirkirin û ew çîroka kakilîn dibe navenda çîrokê. Loma jî min ji vê çîroka kakilîn hez kir û min serê pêşîn çîrok nivîsîn.

- Gava ku behsa wêjeya Erebi tê kirin, tê gotin ku “helbest diwana Ereban e”, çunku helbestbêjiya wan a tomarkirî û parastî diajo heta bi heyama berî Misilmanîyê, lêbelê gava meriv li wêjeya devkî ya Kurdan dinêre, meriv rasterast dibîne ku çîrok koşka wêjeya Kurdan ava kiriye, jixwe reng e ku çîrokbêjiya di nava dengbêjiyê de rûyê herî belî yê vê angaştê be; gelo tu alîgirê vê dîtîne yî yan nêrîneke te ya cuda heye?

Ez jî bi te re, lê ne bi temamî. Wekî min li jor jî got, jixwe ji ber çîrokîbûna Kurdî bingeha wêje û toreya Kurdî ji aliyê çîrokê ve hatiye danîn. Loma jî, gava em bala xwe didinê, hemû berhemên pêşdînî (pêşolî) û ên sekuler (derdînî-derolî) çîrok û destan in. Di gel vê yekê jî, mixabin, hemû berhemên me ên şîira klasîk, çendî ku bi Kurdî bin jî, çendî ku di wan de Kurdewarî li pêş be

jî, ji alîyê şewê û şewazê ve, di bin kartêka olê û rêgezên şîira Ereban de ne. Di vî warî de, gotineke Arjen Arî heye, dibêje: “Cegerxwîn şîira Kurdî ji esman anî xwarê û kir helbest.” Ev gotin, ji vî alîyekî ve di cî de ye ku; şîir piştî Cegerxwîn, êdî ne tişteki olî û xwedayî tê dîtîn. Lê dîsan jî, helbest di roja îroyîn de jî, textê xwe ji tu cureyê wêjeya Kurdî re nehiştiye, ji ber ku em Kurd hîn bi temamî neketine nav helûmercên jîyana ku çîrok û romanê diafirîne û ji xwe dizê.

Lê gava em ji awirekî dîtir ve bala xwe didinê, em dikarin bi xweşîkî bibînin û bi pêbawerî bibêjin; berhîm û dîwarên bingehîn ên koşka wêjeya Kurdî ji alîyê çîrokê ve hatiye danîn û lêkirin. Helbet mînak û hêmana peyitandina vê yekê destan û çîrokên gelêrî yên Kurdî ne ku pêşolî û sekuler in. Ev yek rasterast me digihîne folklorê û pê re jî hêmanên çandê. Herçî dengbêjî ye, ez wê bi awayekî dîtir şîrove dikim. Ez dibêjim, dengbêjî, ji ber desthilatîya Farisî û Erebî, demeke dirêj di nav gel de, wekî hêman û heyîneke gel maye.

Lê şîira klasîk a Kurdî, di bin kartêka Erebî û Farisî de hatiye nivîsîn û ji hêla xwendewarîya Kurdan û desthilatîya navxweyî û her weha ji hêla şair û xwendeyên gelên dîtir ve jî qîmet pê hatiye dayîn. Ev rewş bûye sedem

Ez dibêjim, dengbêjî, ji ber desthilatîya Farisî û Erebî, demeke dirêj di nav gel de, wekî hêman û heyîneke gel maye. Lê şîira klasîk a Kurdî, di bin kartêka Erebî û Farisî de

ku Kurdî wekî bêqîmet bê dîtîn. Şairên Kurd jî dilê xwe bi vî desthilatîya Ereb û Farisan bijandiye û bi nivîsîna şîirên erûzî û bi rêgezên şîira Erebî, bi taybetî ji taybetîyên folklorê Kurdî hinek dûr ketine. Loma jî dengbêj bûne ew kes ku di nav gel de bi zimanê ku gel jê fêr dike kilaman dibêjin û çîroka wan tînin ziman; her weha, dengbêj, kêr û hindik be jî, bi awayekî

ji awayan bûne ew kesên ku ji nava gel derdikevin û dikarin xwe bigihînin desthilatîya navxweyî û têkilîyê pê re deynin. Loma jî bi hebûna dengbêj û çîrokbêjan jî diyar e ku çîrok û vegotina çîrokî hîm û dîwarê wêjeya Kurdî ya gelêrî, folklorîk û ya roja îroyîn e.

- Girêdayî pîrsa derbasbûyî, heger wêjeya devkî ya Kurdan ew çend xwe spartîye dîwarê çîrokbêjîyê, çima wêjeya Kurdî ya îroyîn xwe berdaya nava deryaya helbestê û hiştiye ku êdî her kes xwe li meydana helbestnivîsîna Kurdî rakişîne û asta helbesta Kurdî ew qasî nizm bike?

Wekî min got, ji ber ku tenê helbestan dinivîsin, lê helbestan çênakin, ji ber ku ne helbeskar û helbestbêj in, lê helbestnûs in. Îcar, ez dikarim vê jî bibêjim; Kurdî, ji alîyê têkilîya peyvên a bi hev re ve, bi awayekî xwezayî û ji ber xwe ve kûrahîyekê ava dike û ji alîyê vegotin û qîrîna hest û ramanê ve jî, rêyeke pîrr dîlkêş dide ber me Kurdan. Çi gava trajedî û bobelatek li me diqewime, em tavilê radibin hemû qîrîn, hêrs, hest û ramanên xwe bi gotinên ku wekî rist hatine rêzkirin û bi cureyê ku em jê re dibêjin helbest, dinivîsin. Çima? Ji ber ku hêsan e, ji ber ku me navê em hinekî bihewin, hinekî demê bidin xwe da ku ew hest, qîrîn, hêrs û ramanên me di dil û gîyanê me de bêne parzûnandin û em helbestekê jê çêbikin, helbestê bibêjin û paşê binivîsin. Lê em vê yekê nakin, hema di gavê de radibin helbesta xwe dinivîsin û rê namîne ku em karîbin wê bibêjin. Her weha, sedemeke din jî ew e ku; îroroj, em Kurd, hîn jî negihane wê qonaxê ku jîyaneke cihê bi xwe re ava dike û bajar bera bera dibin bajar û em bi wan bajar û bajarokên xwe ve çîrok û romanên xwe jî diafirînin û dinivîsin.

- Li gel nivîskarîyê, te wergera ji zimanê Tirkî kiriye, gelo tu tevgera wergera Kurdî di kîjan astê de dibînî?

Belê, min çend pirtûkên Tirkî wergerandin bo Kurdî, lê tu yek jê jî ne hîlbijartina min bû. Projeyên wergerê bûn û ji min hat xwestin ku ez wergerînim. Helbet pirtûkên ku min li ser navê wergerê, ji Tirkî wergerandine bo Kurdî hene, lê hîn ew neketine ber çapê. Herçî asta wergera bo Kurdî ye, ne zêde xurt û bilind e. Ji ber ku hem karekî profesyonelî divê jê re hem jî divê aborîya wê ji telîfa nivîskarîyê cihêtir û xurttir were amadekirin. Loma jî ev yek ji bo roja îroyîn ne li dar e. Çi karê wergerê ku tê kirin, helbet bi dilxwazî û bi kedê tê kirin. Lêbelê, di nava wan de, gellek pirtûk hene ku hatine wergerandin lê ziman -û pê re jî çanda ku di zimên de diheve- bo hev nehatine wergerandin, pirtûk hatine wergerandin; pirtûk bi hev re wergerîyane kortalên hev. Çima? Ji ber ku kesê ku xwestiye pirtûkê wergerîne, ne zana û serdestî her du zimanan e, bes dikare bi wan zimanan bi xêve û binivîse. Lê ew kes hay ji rih, taybetî û serbihuriya wan zimanan nîne. Gotinek heye, dibêje; çawan ku her kesê ku du destên xwe hene nikare li kimanê bijene, wekî wisan, her kesê ku bi du zimanan dizane nikare karê wergerê bike.

bi du zimanan dizane nikare karê wergerê bike.

- Girêdayî wergerê, gellek wergêr êşa tunebûna ferhengên birêkûpêk dikişînin û bi regekî êşkere dibêjin ku ev yek li pêş wergerandina berhemên zanistî, felsefeyî, hizirî...hwd dibe asteng, gelo ev rewşa xerab a ferhengdaniya Kurdî heta

kîjan radeyê bandorê li tevgera wergerê dike û çavên wergêran dişikîne, ev bêserûberîya di warê amadekirina ferhengên de dê heta kengî dewam bike û li gor te çareya wê çi ye?

Helbet tunebûna ferhengên taybet ên bo dîsîplînên cihê cihê, li ber karê wegerê astengeke mezin e. Ferhengdanerî karekî ne hêsan e. Ji bo amadekirina ferhengekê di warekî, di dîsîplînekê de, çend taybetî bi hev re divên. Her weha dem jî jê re divê. Gava em van hemûyan didin ber hiş û aqilê xwe, em dibînin ku rêyeke pirr dûr û dijwar li pêş me heye. Ez dikarim bibêjim, çi gava desthilatîyeke Kurdan, desthilatîya ku qîmetê dide karê ziman û wêjeyê, hat ser kar û ev yek bû karê sereke û sedemî, wê hingê de ev bêserûberîya ku tu çêl jê dikî, were bikeyskirin. Wekî di jî, çi karê ku dê heta wê çaxê bê kirin, de karê kesîdeyî û takekesî be.

- Serê vê salê, rêzeferhenga te ya bi navê Ferhenga Biwêjan hat weşandin. Gava meriv li vê berhemê dinêre, meriv rastî kedeke pir mezin tê ku tenê sazîyên çandî, enstîtû û komên zimazanan dikarin karekî weha çetin bidin ber xwe, îcar meriv ji xwe dipirse bê çend caran benê pişta te di ber amadekirina vê rêzeferhengê de qetîyaye?

Min nekarî bihejmêrim ka çend caran benê pişta min qetîya, lê ez baş dizanim ku min çendîn caran ji xwe re got: “Divê tu vî karî bibî serî da tu bibînî ka zimanê gel û neteweya te çendîn zengîn e...” Bi temamî bîst sal di ber vî karî de çûn. Lê ji ber ku karê berhevkarîyê karekî wisan e ku hem demê dixwe hem jî bêtî demnedanê pêk nayê; di vê navberê de, gava min biwêj didan hev, min karên dîtir jî dikirin û nivîsînên xwe yên çîrok, roman û gotarên rexne û analîzên wêjeyî dikudandin. Lê ji bo ferhengên her hişyar bûm û min biwêj ji hemû alîyên jîyanê didan

hev; ji gellek der û bajaran, ji devê pîr û kalan, ji pevaxaftinên jinan, ji sihetên di qehwexaneyan de, ji rêwîyan, ji pirtûkan û ji parsekan; min bi awayekî bi dil û daxwazî, bîst salan parsekiya biwêjên Kurdî (Kurmançî) kir. Îcar di karê nivîsîn û amadekiri-na wê de jî, ne benê pişt dimîne ne jî ronîya çavan.

- Di wêjeya devkî û heta di axaftina rojane ya her gelî de, bikaranîna bi zanabûn a biwêjan wekî xwarineke biçêj a têrxwê tê dîtin. Li gor dîtin û xwendina te ya wêjeya Kurdî, nivîskar û wergêrên Kurdîyê heta kîjan radeyê heqê biwêjan dayê û gelo heger me wekî wesifdan zimanê Kurdî wekî zimanekî biwêjî bi nav kir, em dikarin bibêjin ku wêjeya Kurdî têra xwe av ji deryaya biwêjên Kurdîyê vexwariye?

Helbet, biwêj, yek ji hêmanên zimanê devkî ye. Pirranîya wan jî bi serbihurî û bi pêkahetinekê çêbûne. Loma jî, heke mirov bibêje, nivîskarên Kurdîyê heqê wan daye an jî nedaye, dê ev yek ne di cî de be, ji ber ku her nivîskar li gor paşxane û ferhenga xwe ya kesîdeyî dinivîse, loma jî pirtûka ku hate nivîsîn, li gor vê yekê dîyar dibe û çendîn hewce bike ew çend biwêj an jî hêmanên zimanê devkî dikeve nav nivîsê. Ne hewce ye ku kesek rabe hema bes ji bo ku pirtûkê bi biwêjan zengîntir bike, biwêjan bi kar bîne yan jî gotinên pêşîyan û qalibên dîtir bike navê. Ev hemû bi kontekst û çarçoveya mijar, çîrok û rûdanê ve têkildar e. Herçî biwêjîbûna Kurdîyê ye, ew di mentiq û matematîka gramera zimanê Kurdî de her dîyar e û jixwe rêzeqalib û matematîka ku di lêkerên hevedudanî de û di navbera daçekan de heye, vê biwêjîyê rasterast datîne pêş çavan. Helbet, heke nivîskarên Kurdîyê, bi awayekî taybet, li ser ferhengên biwêjan bixebitin, dê karîbin xweşik jê avê vexwin û paşê vê avê ji bo behra wêjeya Kurdî bikin dilopek.

- Tiştê berbiçav ew e ku civaka Kurdî bi giştî û derûdora berteng a nivîskar û rewşenbîrên Kurd xwe li rexnegirîyê ranagirin û gelek caran bersivên rexneyan bi rengêkî hişk tene dayîn û dibin sedema dilmayînan. Di vê atmosferê de, rexnegirîya wêjeyî çawa dikare were avakirin û bipêşvebirin?

Em ji têgiha rexnegirî çî û çawan fêhm dikin, ew girîng e. Gava rexnegirî tê gotin, gotar an jî lêkolîneke akademîk tê bîra min ku li ser bingeha teorîya wêjê û teorîyên dîsîplînên dîtir hatiye nivîsîn. Heke ev be rexnegirîya Kurdî ku tu çêl jê dikî, dikarim bibêjim zêde ne li dar û pêşketî ye û kêmkirî hene ku bi çav û awirê rexnegir hatine nivîsîn. Lê heke mebesta te, çêlêkirin, danasîn û nirxandin be, nexwe ew bîvênevê dibe sedemên ne-lihevî û gengeşeyan, ji ber ku palder û argumanên wan nivîsan tunene û bi temamî li ser hest û dîtîna subjektîv û kesîdeyî hatine nivîsîn. Helbet rexneyên ku bi serîlêdana teorîyê hatine kirin jî ji alîyê ve subjektîv in, lêbelê ew xwedî palder in û ramanekê di tînin rastê. Lê alîyê ku nirxandin, danasîn û çêlêkirinê tîne pê, bi temamî dimîne kesîdeyî. Herçî bersivandina rexneyan e ku tu çêl jê dikî, li ba min tu bersiva wan nîne, ji ber ku ez dihişînim ku rexneya wêjeyî, heke rexne be, ne hewceyî bersivdanê ye, heke ne rexne be, dîsan ne hewceyî bersivdanê ye, ji ber ku ne rexne ye.

Rexnegirîya Kurdî ku tu pîrsa bipêşvebirina wê dikî, bersiva wê di xwendina teorîk de veşartî ye. Teorîya wêjeyê, teorîya dîsîplînên din jê re divê; pê re jî divê ew kesê ku rexnegir e, hay ji çand, folk-

divê ew kesê ku rexnegir e, hay ji çand, folklor, tore û wêjeya zimanekî hebe da ku karîbe, di gel rexnegirîya xwe, teorîyekê jî deyne rastê

lor, tore û wêjeya zimanekî hebe da ku karîbe, di gel rexnegirîya xwe, teorîyekê jî deyne rastê. Helbet ev yek bi xwendinên kûr û dûr, teorîk û zanistî pêk tê. Yanî mebesta min a ji vê yekê ew e ku; divê rexnegirek karîbe berhemekê, an ji alîyê psîkanalîtîkê ve, an ji alîyê sosyo-polîtîkbûnê ve, an ji alîyê dîrokê ve, an ji alîyê civaknasîyê ve, an jî ji alîyê rasteqînîya hundirîn a tekstê ve bixwîne û wê berhemê bide ber dasa zanînê. Wê hingê dê tu kes hewcetîyê nebîne ku bersiva rexneyan bide. Jê pêvetir jî jixwe ne rexne ye; wekî min got, danasîn, çêljêkirin û nirxandin e.

- Di “Sêyîneya Wînda” de, te êş û bobelatên ku hatine serê Kurdan bi pênivîsa xwe anîne der. Gelo wêje û nivîskariya Kurdî karîbû bibe eynika rewşa trajîk a gelê Kurd û dîroka bixwîn a vî gelê binimîne û kaxezên spî bi janên gelê Kurd reş bike?

Helbet karîbû û dê bikarîbe jî. Helbet her nivîskarek ji alîyekî ve hewlê dide ku vê yekê bîne ziman. Bes tiştek hewce ye bo

Hewce ye, ji trajedî û êş û janên civakê, tiştêkî taybet ji nivîskar re bimîne û nivîskar karîbe çêl ji wê tiştê taybet bike da ku ew berhem bibe berhema ku çêla wê trajedîyê dike

vê yekê; hewce ye nivîskar van trajedî û êş û janan neke sedema nivîsîna xwe. Heke wisan bû, wê hingê tiştê hattiye nivîsîn dibe helbest an jî çîrok an jî romaneke angaje. Hewce ye, ji trajedî û êş û janên civakê, tiştêkî taybet ji

nivîskar re bimîne û nivîskar karîbe çêl ji wê tiştê taybet bike da ku ew berhem bibe berhema ku çêla wê trajedîyê dike. Jê pêvtir dê bibe nivîsînên beravêtî û lezlekîrî û hinekî jî di kirasê zimanê rojnamegerîyê de.

- Ji ber nakokîyên sîyasî yên di navbera tevgerên Kurdistanê de, îro şopandina danûstandina di navbera rewşenbîrên Kurd de me rastî zimanekî ne xweş û carinan kirêt dike; gelo sîyaset û nakokîyên sîyasî yên di navbera Kurdan de heta kîjan astê bandor li wêje û rewşenbîrîya Kurdî kiriye?

Hema bibêje pirr zêde bandor lê kiriye. Sedema wê jî ew e ku; -ez ji bo nivîskarîya Bakurê bibêjim- nivîskarên ku piştî 12ê Îlonê çûn Ewropayê, hema bibêje hemû jî ew kes bûn ku karê sîyasetê dikir. Loma jî, gava wan berê xwe da ziman û

“

nivîskarên ku piştî 12ê Îlonê çûn Ewropayê, hema bibêje hemû jî ew kes bûn ku karê sîyasetê dikir

”

wêjeyê, zimanê wan ê vegotinê jî, ê gotinê jî têra xwe bandor ji sîyasetvanîya wan girt. Piştî salan ev rewş li Bakurê bû sedem ku di navbera nivîskarên Kurdîyê de xet û nakokîyên kûr ên sîyasî çêbibin û îraroj, ev yek li Bakurê Kurdistanê li dar e. Helbet nivîskar ji sîyasetê ne dûr in, lêbelê nivîskarîya wêjeyê hinekî jî perwerî, hîrmet û berbihêrîya bo hev (tehemûlkirina bo hev) dixwaze; aha ew rêzgirî, perwerîbûn û berbihêrîya bo hev li ba me nivîskarên wêjeya Kurdî kêmtir e. Sedem hemû ev e.

- Tu heta ku ji wêje û tevgera çandî ya Kurdên Binxetê/Rojavayê Kurdistanê haydar î û tu siberoja zimanê Kurdî bi giştî li Rojavayê Kurdistanê çawa dibînî?

Ne bi temamî be jî têra xwe ji wêjeya li Binxetê heyî agahdar im. Çendîn ku di vî warî de herî zêde têkilîya Bakur û Binxetê heye jî, dîsan jî em xweşik negihane hev. Helbet pirtûkên gellek

nivîskarên Binxetê li Bakurê Kurdistanê çap bûne, lêbelê ez baş dizanim ku hîn gellek nivîskar û berhemdayên Rojavayê Kurdistanê hene ku pirtûkên wan li van deran peyda nabin. Lê bêtî ku nav û navnîşanan belav bikim

dikarim bibêjim ku siberoja Binxetê di gel siberoja Kurdan e; lêbelê taybetîya herî hêvîda û dilxweşker a Rojavayê ew e ku; di wî beşê dil de, Kurd(î)bûnê zêde tişt ji xwe wînda nekiriye. Ev yek jî sedemeke mezin e ku mirov karîbe bibêje, siberoja zimanê Kurdî li Binxetê xwedî çirûskên geş e ku dê rengê ronahîya xwe bide ser asoya Kurdî.

“

siberoja zimanê Kurdî li Binxetê xwedî çirûskên geş e ku dê rengê ronahîya xwe bide ser asoya Kurdî

”

Rewşenbîrê Tundrê

Dema Ku Rewşenbîrîya Kurdî Tovê Nehezîyê Direşîne

| Evdo Şêxo

Di ravekirin û danasîna rola civakî ya rewşenbîrîyê de, rewşenbîrî wekî navgîn û pira di navbera pêkhatî û hizirên cihêreng ên civakê de derdikeve pêş, rewşenbîr jî rola handerê hevbexşandin, hevtêgihaştin û hevjiyînê digirîne û hewl dide ku hêman û prensîpên hevpejirandina merivane di civakê de biçespîne û rûnîne.

“Di her civakê (êlekê, bajarekî, dûgelekê-neteweyekê, împeratorîyekê, şaristanîtiyekê...) de hin kes hene ku xebata di warê ramanwerî, çand û nivîskarîyê de dimeşînin -an, bi kêmanî, di çarçoveya axaftinê çandî, efsûnî û pîrozmend de dipeyivin. Peywira van kesan ew e ku nasnameya komê di rêya axaftin û xîtabên xwe re biparêzin, nîrxên komê yên navendî dîyar bikin û wan bigihînin her dem û cîyî.”¹

Li beranberê rola rewşenbîr a danîn û rûniştandina prensîpên toleransê di nava gîyanê civakê de, rewşenbîrê navtêder, sixêfok, xweranegirtî û êrîşkar heye.² Li vir, peywira rewşenbîr serûbino dibe û rewşenbîrî dibe belaya serê civakê, çunku ew jî cîyê aramkirin, hevgihandin, belavkirina çanda hezê û girtina rişmeya serkêşîya hevbexşandina di navbera pêkhatî û beşên civakê de dipengize meydana berteng a hêrs, dexis, bêserûberîya hizirî û navtêdana neyînî û kavilker.

Cudahîya sereke ya di navbera rewşenbîrê bîrewer/avaker û rewşenbîrê hêrsok, sixêfok û navtêder de ew e ku rewşenbîrê bîrewer/avaker dide ser rêça rexnegirîya dûrî dexisî û zikreşîyê û wekî kesayetîyeke bêalî ya dilêş destê xwe dideyne ser birînên civaka xwe, li hêla din rewşenbîrê hêrsok, sixêfok û navtêder dibe dilê berjewendîyên xwe yê berteng, dikeve jêr sîya desxisî û çavnebarîyê û êdî berjewendîyên giştî yê civakê û hevhezîya di navbera pêkhatîyên wê de diavêje paş guhên xwe.

“Ev hovîtîya ku em îroj li jêr sîya wê dijîn, encama hişyarkirina arzû û kewjên di veşargeha komî yan bêhişî û binhişîya komî ya civakê de ye, wekî ku di dil û naxê her kesî de ye. Bedlên efendîtîyê, stûbend (kravat), solên birqonek û bawernameyên zanîngehan -nemaze ewên ku li dûgelên sosyalîst ên berê hatine xemilandin- li pêş tewişandina arzû û dîlxwazîyên xwemakî nabin asteng...”³

Egerên bingeîn ên berde-wamkirin û geşkirina nakokîyên sîyasî/civakî di navbera komên sîyasî/civakê yê civaka Kurdî de girêdayî rewşenbîrîya Kurdî ya nefrethez, faşîst û tundrê ne.

Egerên bingeîn ên berde-wamkirin û geşkirina nakokîyên sîyasî/civakî di navbera komên sîyasî/civakê yê civaka Kurdî de girêdayî rewşenbîrîya Kurdî ya nefrethez, faşîst û tundrê ne. A gerek ew e ku rewşenbîrên

Kurd hewl bidin zemîneke yeker ji bo kesayetîya neteweyî ya Kurdî deynin û hemû pêkhatîyên civakî û sîyasî li dora hêmanên

“
*Cudahîya sereke
ya di navbera re-
wşenbîrê bîrewer/
avaker û rewşen-
bîrê hêrsok, sixêfok
û navtêder de ew
e ku rewşenbîrê
bîrewer/avaker dide
ser rêça rexneg-
irîya dûrî dexisî û
zikreşîyê*
”

lihevkirî û sereke yên kesayetîya neteweyî ya Kurdî bicivînin, lê berevajî vê hêvî û pêwîstiyê em dibînin ku rewşenbîr bi xwe bûne sedema dadana agirê nehezîyê di nava civaka Kurdî de û êdî -ji ber rengê rewşenbîrîya Kurdî ya mifaparêz û berjew-endîgêr- nîrxên bala û gewre yên gelê Kurd nema têne zanîn. Nimûneyeke berbiçav û teze ya vê hizira jorîn li Rojavayê Kurdistanê rû daye/dide. Berî demekê, gava ku Birêveberîya Xweser a Rojavayê Kurdistanê zimanê Kurdî ji bo her sê polên pêşîn ên dibistanên seretayî yên Rojavayê Kurdistanê wekî zimanê hînkirinê yê fermî pejirand û ferz kir, nakokîyeke mezin ket nava civaka Kurdî ya rûlirûyî bişaftinê û rewşenbîrên Kurd roleke pîrr neyînî û hin caran kavilker di vî warî de gerand. Di vê nimûneya

ji ber helwesta siyasî û dexisîya li dijî Birêveberîya Xweser a Rojavayê Kurdistanê û rêbaza wê ya siyasî, nîrxên neteweyî, mafên merivan û helwestên siyasî hatin tevlihevkirin û kesayetîya civakî û neteweyî ya Kurdî hat pûçkirin û valakirin.

dilsoj de, mafekî herî rewa û sada yê merivan (mafê hînbûn û hînkirina bi zimanê dayîkê) ji hêla rewşenbîrên Kurd bi xwe ve hat kirêtkirin û qebûlnekirin û êdî civaka Kurdî bêhtir ji nîrxên xwe dûr ket. Di vê nimûneyê de, ji ber helwesta siyasî û dexisîya li dijî Birêveberîya Xweser a Rojavayê Kurdistanê û rêbaza wê ya siyasî, nîrxên neteweyî, mafên merivan û helwestên siyasî hatin tevlihevkirin û kesayetîya civakî û neteweyî ya Kurdî hat pûçkirin û valakirin. Vê nimûneyê jî bêhûdetî û xerabkarîya rewşenbîrîya Kurdî şilfitazî kir û ew da ber bêjinga hilsengandina sincî.

Rewşenbîrê Sixêfok

Dema ku meriv nêrîn, nîrxandin û şîrove yê rewşenbîrên Kurd ên li ser rûpelên medyaya civakî û hevdiştinên wan ên di malper, kanalên televîzyonê û êzgehên radyoyê de dişopîne, meriv geh şerm dike û geh mat dimîne, çunku asta nîzm a axaftinan dûrî sinçparêzîyê ye û ew rewşenbîr gellek caran di kortala sixêf û çêrên dûrî parêzkariya civakê de wer dibin, her weha tûndrêtiya di helwestên wan rewşenbîran de gellekî hêvîşikên û bêmifa ye. Tiştê pêwîst ew e ku zîmanê rewşenbîrîyê xwe li nermî û bêhn-fîrehîyê bigire û rewşenbîr xwe li hemberî nakokî, şer, bûyerên trajîk û bînpêkirinan ragirin. Helbet ev nayê wateya ku kesê rewşenbîr bêyî helwest bimîne û li hemberî bînpêkirin û zêdega-vîyên desthilatdariyê bêdeng bimîne, ji ber ku vatîniya rewşenbîrîyê ew e ku desthilatdariyê rût û şût bike û her dem li kêleka gel û civakê be û serî li hemberî bînpêkirina mafên merivan hilde, lê ev hemû di çarçoveya zîmanekî nerm û komker de.

“Herçî helwesta rewşenbîrî ye, di mijara nîrxandina daxuyanî û tevgerên elîta siyasî de, ne divê êrîşkar be, ne divê layangir be jî, lê belê divê bi tenê li ser nîrx û têgehine giştî yê weha be ku li gorî demê neguherin. Em behsa nîrx û têgehên gerdûnî dikin. Di nava van têgehan de, yê herî girîng, heqî û dilsozî û dirustî heye ku divê li hember wekhevî û azadiya ramanî qet neyê jibîrkirin.”⁴

“tûndrêtiya di helwestên wan rewşenbîran de gellekî hêvîşikên û bêmifa ye”

Rewşenbîrîya Kurdî ya Dijmeriv û Hestmirî

Gava ku rewşenbîrî di nava pengava zikreşîyê de gut bibe, kirasê merivanîyê, hestwerî û dilnermîyê diçirîne û bi temami dûrî êşa gel û merivan dibe û li vir jî nasekine, ew êşa merivan bi rengê kirêt bi kar tîne û hewl dide ku zeh-

Gava ku rewşenbîrî di nava pengava zikreşîyê de gut bibe, kirasê merivanîyê, hestwerî û dilnermîyê diçirîne û bi temami dûrî êşa gel û merivan dibe.

metkêşî û jana giran a xelkê di ber peyitandina helwest û nêrînên xwe de bi kar bîne. Di rewşenbîrîya Kurdî ya dijmeriv û bêhest de, nimûneyên beloq ên vê xala rabihurî nayên hejmartin, ji Şerê Kobaniyê heta bi Fermana Şingalê, wêrankirina bajar û bajarokên Bakurê Kurdistanê ji hêla Artêşa Tirk ve û heta bi teqîna terorîst a ku di 27.07.2016an de li Qamişloyê qewimî û gellek merivên bêgûneh kirin qurbanîyên xwe. Di van hemû nimûneyan de, rewşenbîrên Kurd ên bengîyên dexisîyê hewl da ku van bobelat û fermanên li dijî gelê Kurd di ber berjewendî û nêrînên xwe yê kesane de bi kar bînin, helwest û îdeolojîyên partî û tevgerên xwe yê siyasî bipeyitînin û pê re jana gel bi temami hat jibîrkin.

Rewşenbîrîya Sincan

Rewşenbîrîya rastîn xwe dispêre dîwarê sinc û nîrxên lihevkiirî û destnîşankirî yê civakê û her dem bi haydarî û rêzdarî nêzî nîrxên merivan dibe.

Rewşenbîrê rastîn hem bersiv û hem encama civaka xwe ye, her dem ji civakê re dibe pişt, dûrî wê nakeve, di nava bobelat û kambaxiyên wê de diji û ji janên wê re dibe êşbir.

Rewşenbîrê rastîn aramkerê civaka xwe ye, berî her tiştî dixebite ku aştîya navxweyî di civaka xwe de rûnîne û kêşe û nakokiyên wê zêdetir neke, an ku nabe derdê li ser derdan.

“

Rewşenbîrîya rastîn xwe dispêre dîwarê sinc û nîrxên lihevkiirî û destnîşankirî yê civakê

”

Rewşenbîrî helwest e, lê helwesteke rêzdar û sincan e.

Lêveger:

1. Gerard Leclerc: Sosyolocîya Elmuseqefîn/ Sociologie des Intellectuels (Sosyolojîya Rewşenbîran), werger: Dr. Corc Ketûra, Dar Elkitab Elcedid Elmutehîda, çapa yekem, 2008.
2. Li gel ku ev wesif û navlêkirinên destnîşankirî li merivê rewşenbîr nayên û kesên bi vî rengî nakevin çarçoveya danasîna rewşenbîrîyê, lê ez ê di vê gotarê de van kesan wekî rewşenbîr bi nav bikim, çunku civaka Kurd wan weha dipejirîne, wan wekî rêberine hizirî ji xwe re qebûl dike û dikarin civakê tev bidin!
3. Ji hevpeyvîneke malpera Syriauntoldê li gel ramanwerê Ereba Cad Elkerîm Elcibayî, Adar, 2016.
4. Doza neteweyî û helwêsta rewşenbîrane, Îbrahîm Seydo Aydogan, 18.04.2015, malpera Amidakurdê. http://www.amidakurd.net/qunciknîvis/doza_netewey%C3%AE_%C3%BB_helw%C3%AAs-ta_rew%C5%9Fenb%C3%AErane

Ceng Qerebalixê Zêde dike

| Hisên Zêdo

Qerebalix dengên ku bilindbûn, nizmbûn û sertbûna wan ne bi pîvanekê ye û sînorên xwezayî ku guhên mirovan û ajalan bi awayekî hêsan dikare bibhîse, derbas dike.

Qerebalix yek ji berhemên bajarâtîyê ye. Li nava kolanên bajarên mezin rêjeya qerebalixê bilind e. Bandora wê li ser mirovan, ji hêla tendurstîya laş û derûnî ve, heye. Qerebalix girêdayî ye pirrbûna mirovan li çîhekî, wekî bajarên mezin ku pêdivî bi xizmetê û çûnûhatinê heye. Ev pêdivî di encamê de dengên bilind çêdikin û roj bi roj qerebalix di kolanên de pirr dibe.

Bilindbûna rêjeya bandora neyênî ya qerebalixê li ser mirovan û ajalan, li gorî gellek lêkolîneran girêdayî nêzîkbûn, sertbûn û drêjbûna dema wî dengî ye. Her weha dengên ji nişka ve mîna dengê çekan bandora wê li ser guh û endamên din ên laş û derûnîya mirovan ji dengên bi berdewamî bêhtir e.

Li ser vê yekê Dr. Nwîl Cons -mamosteyê zanîngeha Los Anclos- weha dibêje:

“Dengên balafirên nêzîk dibe ku mêjiyê zarokên ku di zikê dayka xwe de bin pûç bike û ew zarok di zikê dayka xwe de laşê wî tekûz nebe.”

Ji hêla tenduristîya laş ve, bandora qerebalixê li ser gellek beşên laş heye, li ser guh, mêjî, dil û hemû endamên din ên laş.

Raporta peymangeha tenduristî ya Ingilîzî (Lêdz) weha dibêje:

“Dengên bilind dihêle ku guh di demeke nêzik de peywira xwe hino hino nema pêk bîne û ew mirov guhên wî ker bibin”.

Gellek dektorên pispor teqezkirine, ku dengên bilind ên ji nişka ve, birînê di beşê nêvî yê guh de çêdike û qerebalix cermê ser mêjî kurmî dike, û dibe sedem ku ew mirov birewerîya xwe wenda bike. Ji aliyekî din ve qerebalix bandoreke neyînî li rehên mêjî dike û dibe sedem ku bêhtengî çêbibe. Li gorî dektorên pispor dibe ku qerebalix dil bisekinîne û dawîyê li jiyana wî mirovî bîne. Bandora dengên bilind li ser derûnîya mirovan jî heye, li gorî lêkolînên dektorên pispor, bêhtirî mirovên ku bi nexweşîyên derûnî ketine sedema wê qerebalix e.

.Ne tenê mirov di bin bandora qerebalixê de zîyanê dibînin, lê ajal jî di bin vê bandorê de sistema jiyana xwe nema nasdikin û berhemên wan kêm dibin. Lêkolînên li ser vê yekê teqez dikin ku Mirîşk kêm hêk dibin û Mêşa Hingiv birewerîya xwe wenda dike û ajalên ku têne dotin şîrê wan jî kêm dibe...hwd.

Du çavkanîyên sereke yên qerebalixê hene, yek xwezayî ye û ya din jî ne xwezayî ye .

Dengên xwezayî dema wan kurt in û bandora wan jî li ser mirovan kêm in, wekî dengên erdhejînê û biroskan. Dengên ne xwezayî bandora wan pirrtir e û çavkanîyên wan li bajarên mezrin pirr in, wekî dengên otomîlan, tirên ,balafir, cenetor, kargeh û dengên alavên kolan û lêkirinê. Her weha dengên kelûpelên malan ên li ser kahrebê têne bikaranîn, wekî televizyon, cilso... hwd.

Roj bi roj deng di kolanên bajaran de bilind dibin û ziyana wê

dibe nexweşî û êş ji mirovan re.

Civak di rêya rêxistinên civaka sîvîl re, li çareserîyê digere û di nakokî û rexnê de ye li himberî desthiladاران e, civak doza jîyanek bê qerebalix dike.

Rêxistinên sîvîl ên guhdanê bi jîngehê dikin, her dem pêşinyarên xwe, ji desthilatdar re pêşkêş dikin, hema di warê pêkanînê de ew pêşinyar mirîn e û rewşa qerebalixê bi zêdebûn berdewam dike. Pêşinyarên ku ji aliyê rêxistinên sîvîl ve, ji bo kêmbûna qerebalixê tene pêşkêşkirin ev in:

-Belavkirina hişyarîya jîngehî di nava civakê de û pênasîna civakê bi ziyana qerebalixê, li ser tenderustîya mirovan û bi taybet li ser zarokan.

-Danîna pîlanên lêkirina bajaran, li ser bîngehên nûjen, ku qerebalix tê de kêmbûn, wekî vekirina kolanên fireh û pîrbûna beşê kolanên teng, her weha çandina daran û çêkirina parkan li nava bajaran, ji ber dar parekê ji deng dimije.

-Avakirina dibistan û nexweşxaneyan dûrî kolanên ku qerebalix lê pîr e.

-Bikaranîna camên duqat di avakirinê de, ji bo girtina deng.

-Çavdêrî li ser otombêlên mezin, ji bo ku derbasî nava bajaran nebin û dengê totîkên wan nekin.

-Avakirina kargeh û balafirgehan, li cihên dûrî bajaran.

Ev pêşinyarana ji bo bajarên ku di aramîyê de jîyan dikin. Hema bajarên ku şer li wan diqewimin û dengên çeka ji dengên her tiştî bilindtir e. Ev pêşinyar dimînin li dawî û radiwistin.

Li deverên ku ceng li dar e pêşinyarine din derdikevin pêş. Wekî dîrxistina şer ji cihên ku xelkên sîvîl lê dijîn, û hêzên pevçûnî jî dive bi mercên teybet rêzgirtina xelkên sîvîl bigrin. Ev mercên ku ji aliyê rêxistinên sîvîl ve tene pêşkêşkirin, di kêlikên şer de girêdana aliyên pevçûnî bi wan ve sist dibe û qerebalixeke

bêhempa çêdibe.

Bajarên ku şer û pevçûn lê diqewimin, qerebalix lê zêde dibe, wekî dengên cenetoran di demên birrîna kahrebê de. Ji vê bêhtir dengên mirovan, ji ber xerabûna rewşa derûnî bilindtir dibe, her weha kêmbûna çavdêriyê li ser bajar dibe sedem ku dengên bilind zêde bibin.

Dengê çekan, li ser mirovan û ajalan, ji hemû dengên dîtir bi bandortir e, nexasim li ser derûnîya mirovan û bi taybet li ser zarokên ku li dengê çekan guhdarî dikin, ji ber dengê çekan tirseke mezin bi xwe re tîne. Li gorî navenda guhdana bi zarokan (AVA) a li bajarê Qamişloyê, ew zarok her bêdivîya wî bi guhdan û dermankirinê heye.

Rêjeya qerebalixê roj bi roj li bajaran bilind dibe, hema di bajarên ku ceng tê de li dar e rêjeya qerebalixê bilindtir e û bandora wê ya neyînî jî pirrtir e. Çareserîya kêmbûna qerebalixê dimîne girêdayî bi nêzîkbûneke berpirsiyarî, ji aliyê desthilatdaran ve, her wisa rawistandina dengê çekan li deverên ku şer lê diqewimin.

Kevintirîn Jêdera Rêzimana Kurdî

| Hekîm Ehmed

Pirtûka Eliyê Teremaxî “Destûra Zimanê Erebî bi Kurdî Digel Hinde Nimûneyêd Farisî û Kurdî”, ji jêderên herî kevin di pirtûkxaneya Kurdî de ye, belkî lêkolîn ti salê bi zelalî ji me re destnîşan nekin lê ev pirtûk berî sedên salan cihê xwe di nav xwendekarên Kurd de girtiye.

Helbet weke her mijarekê li ser berhemên Kurdî yên kevin, dê gellek aliyên mijdar di barê vê pirtûkê û nivîserê de wê bimînin, sedemên vê nezelaîyê bindestîya siyasî ya kurdan e, ku tim ev çand qedexekirî û veşartî maye, eger xwênerek bixwaze li vî zanyarî bigere ew ê li destpêkê rastî gellek şêweyên nivîsandin û xwendina paşnavê wî bibe, weke Termûxî, teremaxî, termûkî, lê tiştê lêkolîn ji me re pêşkêş dikin ku ew ji gundekî bi navê Teremaxê bû, ew gund di navbera Muksê û Hekarîyê li bakurê Kurdistanê ye.



Danerê Pirtûkê û Mebesta Nivîsandinê:

Dema jîyana Teremaxî jî baş nayê destnîşankirin û gellek rexne li profîsor Qenatê Kurdo dibin ku wî demeke mêj ji jîyana van zanayan re di pirtûka xwe “Tarîxa Edebiyata Kurdî” de tomar kiriye, lê em dikarin ji berhema Teremaxî û dîroka dibistanên li herêmên Kurdistan nas bikin ku ew di serdema osmanîyan de bû, lê ev jî tişteki zelal bi dest naxe ji ber desthilata Osmanîyan bêhtirî çarsed salî maye.

Li ser xwendina wî jî agahî hatine nivîsandin ku wî xwendina li derveyî herêma xwe berdewam kiriye, li bajarên Mûsilê û Bexdayê û hin dibêjin ku dawî li paytexta Misrê Elqahîra li Camî’ El’Ezher bû.

Dr. Marûf Xeznedar jî di pêşgotina pirtûkê de dibêje ku ew di sedsala şanzdeh-hivdehan de jîyaye, lê ji alîyekî din ve, eger em nas dikin ku berhema Teremaxî ji bo fêrbûna zimanê Erebi ye, taybet bi xwendekarên Kurd e, ango xwendina destpêkê bi Kurdî ye lê ji xwendekar tê xwestin ku di berdewamîya xwendina xwe de bi zimanê Erebi û rêzimana wî xurt be, her weha zimanê Farisî jî ne zimanekî nenas e li ba xwendekaran, berê me dikeve dema medreseyan Kurdî de.

Ji van nîşanên girîng diyar dibe ku em di dema mîrgehên Kurdî de ne, dema ku desthilateke xwecihî di destê mîrên Kurdistan de hebû, tevî pirranîya caran têkiliya wan bi desthilata Osmanî re di navbera qonaxên nakokî û lihevhatinê de dihat guhertin, lê di sedsalên 17 û 18 an de, zimanê fêrkinê li dibistanên li Kurdistanê bi Kurdî bû û ji bo berdewamkirina xwendina akadîmî berê wan dikete hin bajarên navdar ên derveyî Kurdistanê.

Dîtina Pirtûkê:

Di sala 1971ê de, nivîskar û lêkolîner Marûf Xeznedar ev dest-nivîsa li Leningradê, di Pirtûkxaneyê Amojgeha Rojhilatnasî ya Akademîya Zanistî ya Sovyetê de bi dest xist û di heman salê de bi navê “Destûra Zimanê Erebî Bi Kurdî - Elîyê Teremaxî” li Bexdayê çap kir.

Li gor pêşgotina Pirtûkê hatiye xuyakirin ku mela Mehmûdê Bayezîdî di sala 1274ê koçî (1858ê Z) de, pêşgotinek li ser dest-nivîsê nivîsandibû û ew destnivîs radestî qonsolotê Rûsî yê bajarê Erzeromê Aleksander Jaba kiribû.

Girîngîya Berhemê:

Berhema Teremaxî girîngîya xwe ji gellek alîyan distîne, aliyê xwendin û fêrkirinê ku sedema sereke ji nivîsandina pirtûkê bikaranîna wê ya zanistî bû, li vir eger em bînin bîra xwe ku pîranîya berhemên wê demê bi du mebestan dihatin nivîsandin, a yekem bawerîya olî ku razîbûna xwedê hêvîya nivîskar bû, weke gellek mewlûdên pêxember ku bi zimanê Kurdî ji aliyê mele û mamosteyên olê ve dihatin amadekirin, a din jî peywirîya neteweyî bû ku nivîskarên kurdperwer ên piştî Teremaxî weke Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî dixwestin zanîna xwe bixin xizmeta gelê xwe de û mînak li ser bîrewerîya gelê xwe pêşkêşî cîhanê bikin berevajî nivîskarên din weke Ibn El 'Esîr û Ibin Xelkan ku di çanda desthilatdar de hellîyan û ji gel û zimanê xwe dûr ketin, lê Teremaxî bi awayekî ji her du alîyan cuda xuya dike ku mebesta wî ya sereke zanîn û fêrkirin e.

Girîngîyeke din a vê berhemê heye ew e ku rêzikên sê zimanan (Kurdî, Erebî, Farisî) di pirtûkekê de dicivîne, eger em weke hin

lêkolînerên nijadperest bikin, em ê bêjin ku Teremaxî pirtûka yekem di (Beramberîya zimanan) de nivîsiye, lê kesê pirtûkê bixwîne, dê nas bike ku mebesta daner zanîn e, fêrbûna zimanekî li gor bingeheên zimanekî din e, ev jî ligorî rêbazên fêrkirina zimanan awayekî durist e, kesê mezin ku bixwaze fêrî zimanekî bibe, awayê baş ew e ku bi rêya zimanê wî yê dê re zimanê nû şirove bibe, ji ber wê pirtûkên fêrkirina zimanê Inglîzî taybet bi her gellekî hene ku li gor zimanê wan ê dayikê, ew zimanê duyem tê pêşkêşkirin.

Pirtûk û Zimanê Kurdî:

Pirtûka Teremaxî ji 45 rûpelan pêk tê, lê beşin taybet bi zimanê Kurdî û Farisî jî hene, tev li ku beşên rêzimana Erebi jî şirove dikin li ser bingeha mînakên Kurdî ne, ji ber ew berê xwe dide xwendekarê Kurd, wilo pirtûk di barê zimanê Kurdî de jî weke belgeyekê tê dîtin û danerê wê rêzimanivîsê Kurd ê yekem tê nasîkirin.

Reşîd Findî, beşê girêdayî bi zimanê Kurdî di berhema Elî Teremaxî de, di pirtûka xwe ya bi navê “Eliyê Teremaxî Yekemîn Rêzimanivîs û Pexşannivîsê Kurd e” (Bexdad, 1985) de, bi alfabe ya kurdî ya Başûr nivîsandiye. Findî di pirtûka xwe de, rêzikên Teremaxî bê guherandin weşandine, lê ji ber wî tenê beşê girêdayî zimanê Kurdî çap kiriye, berhem bûye jêdereke rêzimana Kurdî.

Mînakek ji Berhemê:

FESL DI BEHSA FÊ'LA MUDARÎ' DA YE

Di zimanê Kurmancî da pênc sîxe bi der dikevin, zêde nabin.
Weku niha:

Diçî, diçe, diçin, diçim, diçîn.

Ef'alêd mayî jî li van qiyas bike. Evne pênc siyexan ji demayirêd kurmancî hene. Weku niha:

Tu, ew, hûn, ewan, em, me.

Eve şeş demîr jî demayirêd wan ef'alan ne, digel wan têne 'emilandin.

Weke ku di vê mînakê de dîyar dibe, heye kêmayî di gellek cihan de hebe, lê eger em dema pirtûkê bînin bîra xwe, em ê girîngîya wê nas bikin, her weha têrm û zarawayên zimanî yên di pirtûkê de, pirranî bi zimanê Erebi ne û em ji bîr nekin ku ev mînak pêşkek e bo şirovekirina rêzikê di zimanê Erebi de, di mînakê de wê masmoste beramberî wê (Lêkera dema niha) di zimanê Erebi de şirove bike.

Di pitûka xwe ya bi navê “Tarîxa Edebiyeta Kurdî” de, Prof. Qenatê Kurdo dibêje ji bilî vê berhemê, Teremaxî sê berhemên din nivîsîne “Qewlê Yekane”, “Kurêt Weten”, “Moriya Yaqût” û “Jîna Heqîqet Xewn e” lê mixabin ew destnivîs nehatine bidestxistin.

Li dawîyê pirtûkê hê jî belgeyeke xurû ye ku pêdivîya wê bi gellek

lêpîrsîn û lêkolînan heye, girîngîya wê jî dê bi demê re bimîne, ji ber berhem ji alîyê dîrokî ve wêneya dema xwe ye, ji alîyê afrênerî ve hewldana danerê xwe ye û ji alîyê nirxan ve ew nameya mirov e, ezmûna bavan e ku dibe ezmûnek di hişê gelemper ê gel de, ew gava daner ber bi jîyaneke nû ve ye.



Pirtûkxaneya St. Petersburg, cihê ku destnivîs lê dîtine

Ciwan Qado Helbestin bijartî

*Di sala 1980yê de helbestvan Ciwan Qado li bajarê
Amûdê ji dayik bûye.*

Aniha jî li Almanyayê dijî. Berhmên wî:

-Marên kor, helbest, 2003.

*-Bi dizî min di dilê xwe de stra, helbest, 2008, hîn
nehatiye çapkirin.*

1

Wek kirasê feqîrekî ku ji fedîya pîneyan bermeqlûb hatibe li
xwe

Kirin, hatime li xwe kirin.

Ber bi hundir ve kupiya ne xwestek

Wek derzîyên ku nih ji talana tezebûna şadîyê û dirûna birînan
Vegeryabin

Xwe li hawîrdora canê min diçikînin,

Ev canê ku derzîdanka sawê ye

Kizinê nehedanê ye

Motka sîmirgan e, di hundirê wê de razayî me û rûyê min bi
dîlok

Û wêranê seyandîye.

2

Serê min mişt çavên mirîyan
 Ên mişt liberxweketin û ser hev de ne
 Çavine vekirî, nerînên wan di wan de mirar çûne,
 Li bin çîrisînên wan ez laşê teze daxdayî yên xwestekên xwe
 Dibînim, her gav bi cotekî ji wan dibînim digrîm û hesretê tîr
 Dikim,
 Çavên min ji zû ve mirî ne, di nav girî de fetisî ne,
 Di korahîya wan de her roj çavekî nû diseyînim,
 Bînahîyan bi darçînê dinuxumînim.

3

Xewa min qet bi qet bûye
 Wek parîkên nên ên ji ber nexweşan dimînin,
 Wek terîşkên zêde yên berr û merşên koçeran
 Û pîneyên li ser anîşkên hejaran.
 Wan di kêlikên pêşî û çavfireh ên xilmaşîyê de bi hev vedikim û
 Dûra rê didim neheda û taswasan ku li gor hawên xwe ji wan
 Mitêlekê bidrûn, da karibim pê alîyê kurmî di canê şiyarîya
 xwe
 De binixumînim.

4

Navê te wek heywanekî birîndar di şikefta devê min de dinale,
Nale nalên wî şûna dengê min digre, ji birînên wî hingivekî
tarî û

Merd diherike, ji xweşîya wî dixwazim devê xwe biseyînim
heya

Ku sax bim hew vekim,

Ji keyferata xwe nav û gotinan tevî dide ber xwe û dixwe
Peyvxur e, dermale ye lê destê min lê nagere wî serjê bikim
Ew sawêrdana sert a zimanê min e

Gwîzana minyaî ko yî çênî ye

Ku ji bo gurandina mêşînîya mayî hilandîye .

5

Kulîlkên westanê yên zivir î mezin di şûna xwestekên mirî de
şîn

Tên û di sîkên wan ên tîr de mejî fêkîyên gumanê yên xerabe
Diqêşêre.

Gotin bi hev re wek tûpişkine ku lehîyek di kulmoza wan de
Rabûbe diherikin gewrîya min, li wir bi hev vedidin û dimrin.

Ev dengê ketî û fed yok

Ne yê min e

Ev bêhna mirarçûyîna gotinan e

Tirba pêşwext a bînahîyê ye.

6

Di çavê razayî de deştek berfîn diherife û dihile
 Çavê din vekirî şiyar tê de xewnbest çavê heywanekî mirî
 diçîne
 Û bi kulîlkeke xişxaşê wî dinuxumîne
 Di hundirê min de çavê liberxweketinê
 Yê bêbîk sist û bêrazan ziq li min dinêre
 Wek paşîveke sar li ber poşmanîyê tîm danîn.
 Xêzeke sor a zirav î bêdawî di nav pirêzezeke fireh de
 Xwestekeke xwîna xwîşkên xwe di fincaneke ferfûrî de vedix-
 we.

7

Li ser şopa bistanê xewê yê li bin livînan şîn tê
 Livînên poşman û dilbitirsan
 Xwas û bêdeng ji desthilanî dikevim
 Pelên lemên şebeşan ên hênîk rûyê min dinuxumînin
 Di şûna tirsê de fedîyê li ser diparzinînin
 Û xewnbest bi dîlok û kilaman min av didin
 Pêre pêre li ser livînan wek kulîlkeke jehirdar, rengîn î mezin
 şîn
 Tîm
 Li dora min marên zarokan ên ku şopa xewnên xenîmên xwe
 şaş
 Kirine direqisin
 Û zimanê xwe ên çetelî û şayik di ser pelên min re dibin û tînin.

Textê jimar 29

Guy de Maupassant (1850 - 1893) pêşewayê kurteçîrokê, ne tenê li Fransayê lê li seraserî cîhanê ye. Wî 42 sal kir û 6 roman û 300 çîrok nivîsîne.

Di dawîtirîn rapirsîna giştî de ku weşanxaneyên Fransayê pêk anî, Maupassant bi 3,790,000 rûnivîsên firotî di navbera 2004 - 2012an de pileya yekem wergirt .

Çîrokên Maupassant - ku wek romanin piçûk in -belgeyên civaka fransîzî ne di dema xwe de, ew pesn û rewişt û reftar û bûyerên çerxa 19em li ber çavan radixe û vedide, û bi pêntûsa xwe, ya ku wek derzîya dirûtinê ye, ta bi ta vedike û tevna rojeva mirovan tekûz dike.

Ev çîrok: Efserekî fransîz, ku pîrr ji xwe razî ye, dil digire, lê cenga ku di navbera Fransayê û Prusayê de diqewime wî ji yarika wî Irma cuda dike. Yê efsêr şerê dijminê welatê xwe bi mêranî dike û “xaç” a rûmetê werdigire, lê di wê navê re, çi hate serê yarika wî ya ku bajarê wê kete di bin destê Prusan de. Wê jî şer kir, wê jî dijminên welatê xwe bi kuştin dan lê bi awayekî din.

Daner: Guy de Maupassant

Wergerandina ji zimanê Fransî: İbrahim Xelîl

Hema ku kapîtan “Épivent” li devê rê xuya dibû, hemû jin li şopa xwe vedigerîyan. Bi rastî, ew nimûneya efsêrê spehî bû, her dem nimayîş dikir û xwe paye dikir bê hedan. Ewî pîrr guh dida simbêl û bejn û bala xwe ku bi rastî dilkêş û xweşik

bûn. Simbêlê wî yê kej û rep lêvên wî dinixumandin wek kumekî ku tu ji rengê genimê gihayî û terr tu çêkî. Ew simbêl bi nazikî badayî bûn û bi qiraxa devê wî ve diherikîn weke du xalên mûyê hûr, û dûmena mirovekî gîyanbaz bi ser sikûmê xwedîyê xwe ve berdida.

Bejna kapîtan Êpivent zirav bû te digo her dem kemer li newqê ye, sîng xurt û pehn û kunbedî, û çîm seyrkêş bû wek çîmê werzişvanekî yan semakerekî ku masulkeyên wî hemû livên di bin pantalonê sorî teng de şêwe bike.

Ku dimeşîya, lingên xwe bi teql radida bi destan re wek meşa hespebazan ku bi wî awayî nîrxê newq û çîman diyar dikir. Wek mirovekî serkeftî di cilên yeker (uniform) ên xwe de bû, lê bi rastî tenê rodingot lê ne dihatin.

Wek pirranîya efseran, kapîtan Êpivent nizanîbû kincên sîvîl li xwe ke. Dema ku wî kincin bor an reş li xwe dikirin dibû wek zarokekî li ber devê dikanekê. Lê ku uniform li xwe dikir, şûr simbêlê wî ne dibirrî.

Serî xweşik, poz zirav û xûz, çav şîn û enî teng bû, lê mixabin, keçel bû. Wî qet fêm nedikir çima porê wî weşîya lê carcaran bêhna wî bi simbêlan fereh dibû hember qoqa wî ya kirêt û bê mû.

Ew ji tu kesî ne xweş bû, tevayîya xelkê pîs dikir, û kesên bûrjiwaz li cem ne tişteke bûn, digot ev ajel in, û wî guh dida çûkekî yan mirîşkekê bêhtir ku guh dida wan. Tenê efser diketin di çavên wî de, lê hemû li cem ne wek hev bûn, wî qedrê yên spehî bêtir digirt ji ber ku qedrê yê efser di sawa wî de ye. Yê serbaz li cem wî mîna mirovekî mêr wek şeytan e, xwedê ew afirandîye ta ku ew ceng û evînê biafirîne, mirovekî tund û mêr û bi saw û ne tişteke din.

Wî li generalên artêşa fransîzî dinerî li gor dirêjbûn û sikûm û madê wan yê tîrş. Wî li “Bourbaki” wek nimûne dinerî ku yek

ji gewretirîn cengawerên çerxên nûjen be, û pirrcaran tinazîyên xwe bi wan efserên rêzgelê, ewên kin ku bi meşê re bêhnçikan-dî dibin, fikir, lê riswakirina wî bêhtir bû dijî wan belengazên lawaz ku derçûyên dibistana polîteknîk bûn, wî her dem digot ku ew zilamên kinî zirav î bi guzlik û bêhiş nabe ku uniformê li xwe bikin wek çawa nabe ku keroşk heman rêûresiman li dar xin. Kapîtan Êpivent pirr aciz bû ku seqetên wisa bi çîmên xwe yên zirav di artêşê de bin, ku wek kevcalan dimeşin û venaxwin û hindikî dixwin û têkilîya hevkeşeyên bîrkariyê di ser ya qîzên xweşik re digirin.

Serkevtinên Êpivent li meydana jinan baş hebûn, û çî cara ku wî li gel jinekê vedixwar ew bê guman wê şevê hevalê wê yê nav livînan bû, û heger wê şevê bidest neketiba ew piştrast bû ku sibe roja serkevtina wî ye.

Dostên wî ku li gel yarikên xwe bana hez nedikirin ku çavên wan li Êpivent keve, û bazirganên ku ji mêryarin wan î qîz û xweşik hebûn ew xweş nas dikirin ji lew re jê ditirsîyan û ji ber dîtina wî diqurmiçîn.

Dema ku ew dibuhurî, ya firoşer di ber camê re awir li gel vediguhast, awireke ji hinguv şîrîntir ku hem daxwaz û hem bersivdan di nav re derbas dibûn, hem arezû û hem jî soz.

Mêrê wê, ku bi remekî, pê hest dibû, dizivirî û awireke tund diavête xeyalê vî efserê belî paye. Hema ku Êpivent – devliken û jixwerazi – derdiket, yê bazirgan kulma xwe bi acizî li maseyê dida û diqîrîya:

-Dikê mezin! Gelo kengî em dê xwarinê ji devê van pûçên ku teneke li ser mila ye qut bikin?! Yê goştîfiroş li cem min jî yê serbaz çetir e, hema bi kêmanî ew xwîna li ser maseya wî xwîna ajelan e, û ew mirovekî bi sûd e, û kêra wî ne ji bo kuştina mirovan e, lê ez fêr nakim ew çima dihêlin ku ev gelkujên ha xwe bi

amêrên kuştinê li pêş me nimayîş bikin, belê, dibe ku gerek be lê bila hinekî kêr bikin, û nehêlin van rûpoşkan li gel pantalonên sor û qutikên şîn li xwekin, ma mirov kincê serbirran li bejna xwe dike, hewarê...ma ne wisa ye?

Jinika firoşer milên xwe bi hêminî dihejîne û tu bersivê nade, êdî mêr gûrtir dibe:

*-Mirov ne ajel be naçe temaşeya vê nimayîşa dîkan nake.
Nav û dengê kapîtan Épivent li tevahîya parçeyên artêşa fransî belav bûbû.*

Sala 1868, betalyona wî (Husar 102) hate şandin bo qîşleyekê li “Rouen”. Nav û dengê kapîtan dabû pêşiya wî. Ew her êvar dora seet pênc, diçû seyrangeha “Boieldieu” ku “absent”ê li çayxaneyê “Comédie” vexwe. Lê her berî ku derbas be, wî gerrek li seyrangehê dikir û simbêl û bejn û bala xwe dîs nimayîş dikir. Bazirganên “Rouen” ku li seyrangehê bûn, dest li paş kimaxan, bi guftûgoyên kar ve daketibûn, behsa vebûn û karûbarê sûkê dikirin, hema çav lê diketin, wan di ber xwe de dikir pistepist:

-Hey wax, çi zîlamê spehî!

Û ku wan ew nas dikir, di cih de digotin:

*-Wey wey, ev e kapîtan Épivent, çi mêrê mêrxas e lo.
Jin jî ku çav lê diketin fedîyê dida ser wan, bi xwe hest dibûn wek ku lawaz û tazî ne li pêş wî. Wan serên xwe berra ber xwe didan li gel xendeyekê, bi dilê wan bû ku bikevin di çav Épivent de û awirekê jê vedizin.*

Dema ku Êpivent bi hevalekî xwe re ba -û wisa çêdibû- wî hevalî bi çavnebarî di ber xwe de digot:

-Li min û vî Êpiventî yaw, ma ev qas bextewer e!

Yarikên bajêr ketin pêşbirkê ka wê kî Êpivent bi dest xwe bixe, ji lew re ew hemû bi hev re seet pênc dihatin seyrangeha Boieldieu, cotecot kirasên xwe nimayîş dikirin, û efser û serkirde li ser rêrexa hember wan jî cot bi cot şûrên xwe nimayîş dikirin berî ku derbasî çayxaneyê bibin.

Êvarekê, li pêş dergeha “Comédie”, hentorê “Irma” ya spehî ku yarika bazirganê gewre “Templier Papon” bû rawestîya.

Irma peya bû, û berê xwe da “Paulard” ê nexşevan, ka ji bo kîrîna hin kaxetan an tembîya hin kartan bû. Irma di ber maseyên efseran re bihurî û awirek berda kapîtan Êpivent ku bi sed zimanî digot “Hema tu bixwazî”. Ew awir hingî diyar û vedayî bû, sertîp “Prune” ku li gel serhengên xwe meya kesk vedixwar nema xwe girt û got:

-Ev bêbav çî bextewer e.

Û hingî ew gotin dûbare kir, deng çû kapîtan Êpivent û ew pê beşî.

A din î rojê, kapîtan Êpivent, bi cilên xwe yên berkevtî, çend carekê di bin pencereya “Irma ya spehî” re bihurî, wê ew dît û di ber xwe de beşî. Wê êvarê bi xwe, ew bû yarê wê. Wan xwe heşkerekî kirin û bi serfirazî evîna xwe dida xuyakirin.

Tevayîya bajêr –ji pêvî birêz Templier Papon– ev çîroka evînê kir benîşt û bi şev û roj cût.

Kapîtan Êpivent bi şanazîyê diçirîsî û geş dibû û her demê wî li pêş dost û hevalan dûbare dikir:

-Irma ji min re got, îşev wisa digot, duh ser şîvê, ew ê...

Serê salekê, evîna wan li Rouen belav bû. Wek ku alayek ji dest dijmîn derxistibe, wisa Êpivent bi şanazîyê hest dibû, hêvîyên wî ji paşerojê û bidestxistina Xaçê bêtir bûn, çi ku çavên tevayîya xelkê ji ser wî ranedibûn, û her ew pê dilgeş bû ku ew her dem di bîra wan de ye.

Wan salan, ceng vêket, batelyona kapîtan Êpivent ya yekemîn bû ku hate şandin ser sengeran. Xatirxwazî di navbera wî û Irmayê pirr bi êş bû, şevekê sax dom kir. Şûr, pantalonê sor, kum, kursî li erdê, kiras û kutekiras û goreyên hevrêşim li tenîsta uniformê li ser berrikê...tev belawela bûn. Ode tev de lihevketî bû wek ku marek lê hatibe kuştin. Irma, dîn û por vedayî, destên wê yê bêhêvî li dora stûyê Êpivent, carcaran hembêz dike û berdide. Dimeşîya û bi kelupelên malê ve dilikumî, rûberê kursîyan radikir, û depên wan gez dikir. Êpivent jî ketibû di hev de, pirr aciz bû û nema dizanîbû ka çi bibêje:

-Irma, delala dilê min Irma, ev nayê gotin lê ez bêçare me.

Û carcaran, wî tilîka xwe diavête hêsiroke wê ji ser çavan dimalişt. Bi hilata rojê re, her du evîndar ji hev cuda bûn. Irma bi tirimbêla xwe da dûv yarê xwe ta qonaxa yekem, û li pêş hemû endamên betalyonê, wê ew hembêz kir. Hevalan bi çavekî mezin li vê hez-kirinê nerîn, û bi germayî milên Êpivent hejandin:

-Ey qebreman, ya wê jî mêranî ye ha.

Di wan kêlikan de, hestekî neteweyî da ser hemû dilan. Di wê pêngavê de, betalyona Êpivent êşeke zor di şer de kişand.

Yê kapîtan bi mêranî şer kir ta ku Xaç wergirt. Û çawa şer bi dawî bû, ew vegeyîya Rouen, û berî her tiştî wî pîrsa Irma kir lê mixabin tu kesî tişteke jê nizanîbû, hinekan got ku Irma bûye yara efserekî di serkirdayetîya Prûsî de, û hinekan jî got ku ew vegeyîyaye cem malbata xwe ya cotkar li gundewarên “Yvetot”. Yê kapîtan xwestekek şande ji muxtar re ku li mirinnameyê li navê Irma bigerin, lê wan tu tişt nedît. Êdî kuleke mezin ku nayê veşartin da dilê wî, wî gazin ji dijminan kir, digot ku ev belaya ku hate serê wî ji dûv wan bêbavên Prûsiyan e ku Rouen dagîrkirine:

-Xem nake, di cenga hatî de, ez vê ji wan re nahêlim.

Sibehekê, Êpivent derbasî xwaringeha qîşleyê dibû, nameberekî kal bi yelek û kumekî şayîk zerfek da dest. Wî zerf vekir û ev gotin xwendin:

“Xoşewîstê min, ez li xestexaneyê me, pîrr nexweş im. Ma tu nayê min nabîni. Bi lez were û dilê min xweş bike... Irma”

Rûyê Êpivent zer bû, dilê wî bi Irma şewitî û got:

-Keça belengaz, ez ê nîvro herim serdana wê.

Êpivent li ser xwaringehê her tişt ji efseran re got:

“Bêguman, wan Prûsiyên pîs malê wê talan kir û wan ew tenê bê firingek li wê rastê hişt... Ax, Xwedê ji wan re nehêle.

Heval tev aciz bûn. Êpivent destên xwe zuha kir û rahişte şûrê xwe, sînga xwe nepixand ku bejna wî zirav xuya be, qayîşa xwe

girêda û bi lez berê xwe da xestexaneya bajêr. Derbasbûna xestexaneyê ne asan bû wek ku jê werê, ew naçar bû ku kaxetekê ji sertîpê xwe bibe ta ku bihêlin ew derbas be.

Êpivent hinekî bendewar ma berî ku yê rêveber destûra wî bide li gel silaveke sar û madekî tirş.

Li ber derî, Êpivent bi acizîyekê hest bû ji vê dera perîşan û mirdar. Yê xizmetkar ode jê re destnîşan kir. Êpivent tena tena dimeşîya ku tu deng jê neyê di wan bihurên dirêj û têr bi bêhna nexweşî û dermanan de. Piçûktirîn pistepist dikare hêminîya xestexaneyê bişikîne. Di ber hin derîyan re, Êpivent çav li xewgehekê ket, rêzeke textan ku şêweya laşan di bin de dîyar dibû. Hin yên nîvrehet li ber qiraxa textên xwe rûniştibûn dirûtin dikirin, uniformê wan cilekî bor û kumekî spî bû.

Yê xizmetkar ji nişka ve rastî holeke tijî nexweş rawestîya. Li ser derî bi tîpin girs nivîsî bû “NEXWEŞÊN SÛSEKÎ”. Êpivent lerizî û li ber xwe ket. Ya peristar, ku li ber derwazeyê derman li ser maseyeke dep î piçûk amade dikir, jê re got:

-Ez ê rê şanî we bikim, ew li odeya 29an e.

Û wê da pêşîya yê efser, û tilîya xwe rastî odeyekê kir:

-Ev ew e.

Ji pêvî çarçevên nepixî, Êpivent tişteke nedît, serî bi xwe di bin çarçevê de bû. Li hawîrdor, nexweş li ser textan, rûyin zerhimî û matmayî li uniforma wî dinerin, hin qîz û hin pîr lê hemû kirêt û rûşuştî di wan uniformên xwe yên fereh de.

Êpivent lihevketî bû, destek li ser şûr û yê din bi kum ve, kire pistepist:

-Irma.

Çarçev hilat û rûyê Irma ji bin ve xuya bû, hey wax ew çî qas hatîye guhertin! Hingî ew lawaz û westîyayî bû, Êpivent ew nas-nekir. Irma bi helkehelk qîrîya:

-Albert... Albert... ev tu wî!... Ax... baş e, ev baş e.

Hêsir ji çavan barîyan. Ya peristar kursîyek anî:

-Fermo, cenabê kapîtan

Yê kapîtan rûnişt, çavên wî her li ser Irma bûn, ew guncîya ku duh wek perîyekê bû îroj perîşan û zerhimî ye. Wî jê pirsî: Ka çî bi serê te hatîye? Wê di nav hêsirên re bersiv da û got:

-Te bi çavên xwe dît çî li ser derî nivîsî ye. Û bi pêçeka çarçevê rûyê xwe veşart.

Yê kapîtan matmayî û liberxweketî got:

Hewar... ka çawa te ev nexweşîya pîs vegirt delala min?

-Prusên gemar rûyê min bi zorê bir, wan ez jehrî kirim.

Gotin ji devê Êpivent derneket, wî tenê kumê xwe li ser çoka xwe dizivirand. Nexweşan lê dinerî, ew hest dibû ku bihneke ne xweş tê, wek bêhna goştê kufikî û bêhna hetîketîyê li vê dera tijî qîzên ku bi vê nexweşîya berfedî ketine. Irma bi dengeke hêdî got:

-Ez rehet nabim, doktor dibêje ku ev nexweşî pîr pîs e.

Ji nişka ve, çavên wê li Xaçê ket, beşîş û got:

-Oh, te ew wergirt, çi kêfxweş im, çi kêfxweş im, oh! Xwezî min karîba te maç kiriba.

Di cih de, madê Êpivent tîrş bû û ji tîrsa çermê wî lerizî. Wî dixwest ku bi lez û dem berî demê ji vir derkeve ku bayekî paqij bikişîne û nema careke din rûyê vê jinê bibîne, lê ji neçarî ew rûniştî ma, nizanîbû çawa oxirê jê bixwaze, got:

-Doktor tu nedîtî ?

Çavên Irma pêteke sivik weşande û got:

-Na, min xwest berî mirinê heyfê hilînim, êdî min tev bi jehrî xistin, tev, çi kesê ku min xwe gihande wî. Û ta ku ez li Rouen bûm min xwe bi derman neda.

Yê kapîtan bi acizî û tinazîya tevlihev got:

-Ji vî alî, min bihîst ku te texsîr nekiriye.

Rûyê Irma sor bû û got:

-Belê, bêhtirî yekî bi gunehê min mir, min heyfa xwe hilanî.

Yê kapîtan dîs tinazî kir:

-Xwezî bi dilê te, êdî.

Û xwe amade kir ku rabe lê pêşî got:

-Heydê, ez dê anuha dev ji te biqerim çi ku gerek ez li cem yê sertîp bim seet çar.

Irma, helçûyî, qîrîya:

-Dîsa, tû yê dîsa min tenê bihêlî! Wax, tu nuh hatiyyî.

Lê yê kapîtan, çawa ku bû, ne dixwest bimîne, got:

-Tu dibînî, ez di cih de hatim, lê ji dil, gerek ez yê sertîp seet çar bibînim, ez neçar im.

Irma pirsî:

-Sertîp Prune, ne wilo?

-Belê, ew bi xwe, ew du carî birîndar bûye.

Irma pirsî:

-Ma tu kes ji hevalên te hate kuştin?

-Belê, Saint-Timon, Savagnat, Poli, Sapreval, Robert de Courson, Pasafil, Santal, Caravan, Poivrin, tev mirin. Destê Sahel jê bû, û lingê Courvoisin şikest, û Paquet çavê wî yê rastê teqîya.

Irma xweş guhdarî dikir, û ji nişka ve got:

-Tu naxwazî maçî min bikî, ka bibêje, berî ku Langlois xanim vegere?

kapîtan bêdilî xwe enîya wê ya zerhimî maç kir, û Irma ew bi

germî hembêz kir û bi dînîtî maçî betena şîn ya taximê wî kir, paşî got:

-Tû yê vegeirî, bibêje min ku tû yê vegeirî, sozê bide min tû yê vegeirî.

-Belê, sozê didim te.

-Kengî, tû yê karibî... pêncşemê?

-Belê, pêncşemê.

-Pêncşemê, seet du.

-Belê, pêncşemê, seet du.

-Sozê bide min.

-Sozê didim.

-Oxir be kezeba min.

-Oxir be.

Kapîtanê lihevketî, rabû û di nav pêlên awirên nexweşan re meşîya, wî bejna xwe hinekî tewandibû ku kintir xuya be. Û çawa xwe li derve dît, bêhnek ji kezeba dilê xwe kişande. Êvarî, heval li dora wî vehewîyan û pirsra Irma jê kirin, wî bi kurtî û acizî bersiv da:

-Ew bi sermayê ketibû.

Lê sitvanekî xort jê bawer nekir û rahişte xwe û çû pirsgehê, û a din î rojê, çawa yê kapîtan derbasî xwaringeha efseran bû, bahoza ken û tinazîyê di rûyê wî de rabû. Dawî, hevalan heyf jê hilanî. Wan zanî jî ku Irma bûbû jina serkirdyekî Prûsî, û ku Irma li gel efserêkî ji hussarên şîn û hin din jî wê, li ser piştî hespê, welat li hevxişt, û ku navê Irma li Rouen bûbû “jina Prûsîyan”.

Heyşt rojan ser hev, Épivent bû qeşmerê betalyonê. Û bi rêya berîdê, têbînî û raçete û destûrkariyên bijîşkan û celebin der-

manan jê re dihatin. Dema hayê yê sertîp jê çêbû, wî bi dengêkî vebirr ragihand:

-Baş e, xuya ye pêwendîyên kapîtanê me bi wir re hene, ez dê silavên xwe jê re rêkim.

Piştî dora duwazde rojan, nameyeke nû gihaste destê yê kapîtan, Irma doza serdanê lê fikir, wî bi acizî name çirrand û tu bersiv lê neda.

Piştî heyşt rojên din, Irma dîsa nameyeke nû jê re şand ku rewşa wê pirr xerab e û wê divîya ku xatirê dawî jê bixwaze lê wî tu bersiv dîsa neda.

Piştî çend rojan, rêberê xestexaneyê hate serdana wî û got ku jina ku bi navê “Irma Pavolin” li ber mirinê ye û ku ew bi hêvîya hatina wî ye.

Yê kapîtan ne diwêrî xwesteka yê rêber ret bike, êdî wî berî da xestexaneyê lê bi dilekî tijî kîn û bedxwazî û bi payebûneke birîndar û şahnazîyeke pîskirî.

Dema ew çav li Irma ket, dît ku ew ne hatiye guhertin, û guman kir ku ew wî dixapîne, rabû jê pirsî:

-Fermo, ka te çi ji min divê?

-Tenê min xwest xatir ji te bixwazim, xuya ye dawîya min hatîye.

Lê yê kapîtan jê bawer nekir...

-Guh bide min Irma, te ez kirim qeşmerê betalyonê, û ez nahêlim wisa berdewam be.

Irma jê pirsî:

-Ka gunehê min çi ye?

Hingî yê kapîtan har bûbû, wî nema dizanîbû ka çi bersivê bide.

-Bêhêvî be ku ez careke din vegerim vir û xwe bikim qeşmerê xelkê.

Bi çavên xwe yên vemirî ku çirîskên agir jê pejiqîn, Irma dûbare kir:

-Ka gunehê min çi ye? Ez ji te re ne qenc bûm? Min rojekê doza tişteki li te kiriye? Ne ji te ba, ez dê anuha bi Tamplier Papon re bûma û ne li vî cihê han, va tu dibînî, kî gazinan ji min bike lê tu na.

Bi dengê lerizî, yê kapîtan got:

-Ez ne gazinan ji te dikim, lê ez nema dikarim bême vê derê çi ku reftarê te bi Prûsîyan re cihê şermê ye li serê tevayîya bajêr.

Irma cihê xwe xweş kir û bi dengê lerizî:

-Reftarê min li gel Prûsîyan? Ma ne min gote te ku wan bi zorê rûyê min bire, û min gote te ku min xwe pêş doktoreki nekir çi ku min xwest ez heyfê hilînim û wan ji bi wê êşê bixim, û ku min xwestiba rehet bim minê karîba. Lê min kuştina wan xwest, û min ew pêk anî.

Yê kapîtan, hîn şipya bû, got:

-Çawa be, ew şermawer e.

Bêhna Irma çikiya û got:

-Şermawera çi? Ku ez ji bo kuştina wan xwe bikujim, ka bi-
axive? Te ne wilo digot dema tu dihatî serdana min li cadeya
“Jeanne d’Arc”? Ox! Şermawer! Lê çi bê serê min ji destê min e,
va tu dibînî çawa ji te bêtir, min ji te bêtir Prûsî kuştine.

Yê kapîtan behitî û aciz li pêş Irma ma bû û ziman diherbilî:

-Ox! Bêdeng be, tu dizanî... çi ku... ev tiştên han... ez rê nad-
im... ku dest bigihê...

Lê Irma guh nedida gotinên wî.

-Bi vê we şerê Prûsîyan kir! Evê rastba heger we nehiştiba ew
bigihêjin Rouen? De ka bibêje. Gerek we nehiştiba nêzikî me
bibin, dengê min tê te? Êşa ku wan ji min dît ji ya te tûjtir bû,
belê, ez... çi ku ez ê anuha bimirim û karê te ku tu xwe li ber
dilên keçikan şîrîn bikî û wan ji rê derxîni.

Li ser her textekî, du çav hebûn ji xwe re li vî zilamê bi uniformê,
ku zimanê wî li hev diket, temaşa dikirin:

-Hiş be... tu dizanî ku... hiş be.

Lê Irma li şûna ku hiş bibe, qîrîya:

-Ox! Belê, tu dikekî spehî yî û ez xweş te nas dikim, heydê ... te
nas dikim, dibêjime te ku min ji te bêtir ziyan gihandiye wan,

*ez, û min ji betalyona te bêhtir ji Prusan kuşt... De here, here...
tirsonêk.*

Yê kapîtan nema bi ser rêya derketinê ve bû. Di navbera her du
rêzên textan re nexweş diçûn û dihatin, û berî ku ew bazde ji
derve, dengê Irma kete di qulla guhê wî de:

*-Ji te bêtir, belê, min ji te bêtir ew kuştin, ji te bêtir...
Yê kapîtan çar çar bi derencê ve gindirî, û çawa ew gihaşte mala
xwe ew nema jê derket.*

A din î rojê, ew bi mirina Irma agahdar bû.

8 Tîrmehê 1884

Heft Sedemên Ku Kirasê Girîngîya Şanoyê Didirûn

Haward Shalwitz

Ji zimanê Îngilîzî: Bihar Mirad

Ji ber ku ez ji malbateke pizîşkan im, min dest bi xwendina pizîşkîyê kir lê paşê min xwendina xwe guhert, min berê xwe da xwendina felsefeyê û herî dawî min berê xwe da şanoyê. Lê gelo heger ez şanoyê bidim ber wan pîşe û karên ku min dev ji wan berdaye, dê hîlbijartina min a xebata şanogerîyê bihêle ez bi awayekî çalak û giranbiha beşdarî cîhanê bibim? Gava ku min di zivistana bihurî de listeyeke bi heft sedemên ku kirasê girîngîya şanoyê didirûn amade kir, min bersiva vê mamikê peyda kir. Li vir jî ez gellekî kêfxweş im ku ez van her heft sedeman bi we re bi par ve bikim.

Sedema yekem ew e ku tu zîyana şanoyê nîne. Bi rastî şano jî yek ji wan çalakîyan e ku mirov bi wan radibe û zîyana



wê ne li tu kesî û ne jî li tu tiştî dibe. Dema ku em bi listikvanî û temaşekirina şanoyê mijûl dibin an dema ku em bi her çal-

akîyeke di vî warî de mijûl dibin, em ne bi cengê, ne bi sitemê, ne bi tawanê, ne bi lînckirina jinê, ne bi vexwarinê, ne bi pornografiyê û ne jî bi tu riswatîyên civakî yan ên kesane jî mijûl dibin -ên dibe ku mirov bi wan mijûl bibe, “ji ber vê yekê tenê wekî civak, em çî qasî dem û enerjîyê di ber şanogerî û hunerê de bidin, ew qasî dê rewşa me baştir bibe.”

Sedema duyem ew e ku şano bi awayekî pirr balkêş derbirîna pêdivîyên mirov ên sereke dide pêş. Dibe ku mirov navê şanogerîyê bike behremendî, dema ku em di lîstikeke şanoyê de hawê tiştekî bikin da ku em xwe di nava çîroka lîstikê de bibînin û em di rêya çîrok û jêwergirtinan re wateyê bidin wê lîstikê. Dema ku zarokên di lîstika şanoyê de kesayetî û bûyerên rast an ên aşopî binimînin û bigerînin, em dikarin vê behremendîyê bibînin. Peyt û delîl li cem me hene ku karûbar û çalakîyên mîna şanoyê di civakên berê de hebûn, ew jî demeke gellekî dirêj berî damezirandina şanoya Rojavayî ya Yûnanistana kevin. Şano girîng e ji ber ku jîyana me bêtir wê nabe. Şano yek ji egerên herî girîng e yê ku dihêlin em bi mirovahî xwe bihisin û xwe wekî mirov bidin pêş.

Sedema sêyem a girîngbûna şanoyê ew e ku ji bo lîstikeke şanoyê here serî, pêdivî bi lihevcivandina xelkê heye, nexwe şano dihêle xelk li hev bicivin û bigihin hev. Divê ji sed heta hezar kesî yan bêhtir jî li devereke nêzîk du saetan werin ba hev, bi hev re li bûyerê/çalakîyê temaşe bikin û pê mijûl bibin, bûyera ku dibe kêf û xweşîyê li mirov peyda bike, an heye ku mirov bide ramandin, an heye ku mirov ber bi guhertinê ve bidehfin. Di dema ku em zêde li pêşîya ekrana televîzyonê li hev dicivin û pêwendîyê li gel hev datînin, ez hizir dikim ku ev karê şanoyê yê lihevcivandina xelkê tiştekî gellekî girîng e.

Sedema çarem ew e ku şano wekî axaftineke gelemperî tê dîtin, axaftina ku ji me re jîyaneke demokratîk dide dîyarkirin û

jîrekîyên me ava dike ku em karîbin li axaftineke ji gellek alîyên cuda cuda guhdarî bikin û em bi liberxwedanên heval û hogirên xwe re hevdil bibin; ew hevalên ku dibe nêrînen wan ji yên me cuda bin. Dema em li listikeke şanoyê temaşe dikin û nakokîya ku bûye mijara listikê çareser nabe, em ji vî tiştî sûdê digirin û em hînî gellek tiştan dibin, ku jixwe dema kêşe çareser dibe, dîsa em sûdê werdigirin. Ew ne tişteki surprîz e dema em dibînin ku di civakên zordar de gellek caran şano bûye alîgira tevgerê û civak ber bi hizirê pak û azadîyê ve bîriye. Li Afrîkaya Başûr, şano roleke girîng li dijî nijadperstîyê gerand. Li Czechoslovakîyê nivîskarek bû rêberê demokrasîyê nû. Heger nimînende û pîremerdên me yên li Waşingtonê gellek caran biçûna şanoyê, ez bawer im ku dê rewşa me ji wilo baştir bûya.

Sedema pêncem ew e ku şanogerî û temaşekirina li listikên şanoyê beşdarî lêkirina avahîya hînkirin û xwendewarîyê dibin. Dema em li karakteran temaşe dikin û dibînin bê çawa ew li ser dika şanoyê diçin û tîn û dipeyivin, em fêrî baldarî û hestiyarîyê dibin. Di vî warî de, agahdarîyêke tîkûz gerek e, veguhastineke hişî ya bilez pêwîst e û her weha divê zimanê mirov sivik be. Şano me li ser gellek tiştên sûdewer han dide û derûnîya mirovan ji me re belî dike. Di şanomeyên dîrokî de, em wane û fêreyên girîng ên di warê birêveberî û hikûmetgerîyê de werdigirin. Di şanomeyên hevdem de, em ji rewşa xelkê û çanda deverên welatê xwe, an çanda welatên din haydar dibin. Lêkolînan dîyar kiriye ku rewşa şagirdên ku beşdarî listikên şanoyê dibin li dibistanê çêtir e. Dema ku zarok listikeke şanoyê bi hev re digerin, ew dûrî tenêbûnê dikevin û ev tişt alî wan dike ku bi awayekî tendirust bibin zarokine sosyal.

Sedema şeşem ew e ku şanogerî wekî pîşesazîyekê di aborîyê de beşdar dibe û roleke taybet di vejîyandina taxên paşguhkirî de digerin. Ev tişt gellekî di bajarê me de dîyar bû. Mirov dikare rola

ku Şanogeha Studyoyê li Kolana Çardemîn gerandiye bibîne, an a ku Şanogeha Shakisperareyê li Kolana Heftem gerandiye, an Şanogeha Gala Hisponicê. Dema her yek ji van şanogehan dihat vekirin, temaşevan wekî lehîyê diherikîn van şanogehan, xwarîngehên nû dihatin vekirin, karine nû peyda dibûn, peyrêyên bajêr jî dihatin pakkirin û taxên ku berê kêşedar û qedexê bûn, niha bûne navendên çalakîyan ên herî çalak.

Wekî din, heger em behsa sedema heftem a ku girîngîyê dide şanoyê bikin, em dikarin bibêjin ku ev sedem giranîyê dide hin celebên şanoyê û bi rengekî qelstir di hin celebên din de diyar dibe. Ji ber vê yekê bandora wê li ser awayê hizirîn û jîyana me heye û ew me han dide ku em bi kûr û hûrî li ser kesayetîya xwe, prensîp û reftarên xwe bisekin. Di vî warî de, serpêhatîyeke herî balkêş di giftûgoyeke berî nîşandana lîstikeke şanoyê de qewimî, ew serpêhatî li Şanogeha Woolly Mammothê rû da, dema jinekê got ku lîstikekê ji listikên me hişt ew û hevjinê xwe eşkere bikin ku kêşeyeke aloz di zewaca wan de heye, divê ew herin pisporekî bibînin û şewira wî bixwazin. Wan weha kir û îroj ew jin bi kêfxweşî ji me re dibêje ku ew û hevjinê xwe hîn bi hev re ne.

Wekî me li jor anî ziman, ev in her heft sedemên ku girîngîyê didin şanoyê. Ew zîyanê li kesekî nake, derbirîna der barê behremendiya mirov de dide pêş, xelkê li hev dicivîne, axaftineke demokratîk bi rê ve dibe, di hînkirin û xwendewariyê de beşdar dibe, rewşa aborî vedijîyîne û bi pêş ve dibe û herî dawî bandora wê li ser awayê hizirîna me û meşandina jîyana me heye.